DANISH HEALTH AUTHORITY

Ji derziya şewbeyê re bibêjin erê

Ew biryareke tendurist e

Derzîkirin ji bo hemû mirovên 65 salî û jortir, ji bo mirovên xwedî nexweşiyên demdirêj û mirovên din ên xwedî metirsiyên taybet bêpere ye.

Li gel bijîşkê xwe an jî li gel cihê ku hûn piranî tên derzîkirin hevdîtinekê çêbikin.

Şewbe pêketineke vîrûsî ye ku her kes dikare jê bigire. Ji bo hin kesan nexweşî dibe ku xwedî gefa-kuştinê be.

Hûn dikarin derziya bêpere ya şewbeyê li xwe bidin eger hûn 65 salî an jî jortir bin, eger nexweşiyeke we ya demdirêj hebe yan jî hûn bi şiklekî din di nav metirsiyê de bin,

Hûn dikarin li gel bijîşkê xwe yan jî li gel cihê ku hûn piranî tên derzîkirin hevdîtinekê çêbikin.

Şewbe çi ye?

Şewbe pêketineke vîrûsî ya gelekî têger e ku bi rêya dilopikên piçûk derbas dibe eger mirovek bikuxe an jî bipişke yan jî bi temasa li rûxarên ku bi vîrusê qirêjbûyî bike. Eger hûn 65 salî yan jî jortir bin, eger nexweşiyeke we ya demdirêj hebe, an jî hûn bi şiklekî din di nav metirsiya bilind de bin, dibe ku nexweşî pir giran be, dibe ku we rakin nexweşxaneyê û, di rewşa herî xirab de jî, dibe ku nexweşî xwedî gefa-kuştinê be.

Kî dikare bêpere bê derzîkirin?

Mirovên li jêrê dikarin bêpere bên derzîkirin:

- Hemû mirovên 65 salî û jortir
- Mirovên xwedî hin nexweşiyên demdirêj
- Jinên ducanî yên di sêmeheya duyem an jî sêyem de
- Mirovên gellekî qelew
- Mirovên zû malnişîbûne
- Mirovên xwedî metirsiyên taybet
- Pisporên tenduristiyê yên ku xwedankirin an jî tedawiya wan mirovan dikin ku di nav metirsiyeke taybet de ne ku bi nexweşiya şewbeyê bigirin.

Eger hûn di nav şikê de ne ku hûn an jî endamekî malbata we dikeve nav ji wan koman yekê, ji kerema xwe bi bijîşkê xwe re bikevin nav têkiliyê. Bijîşkê we dikare bibe alîkar da ku hûn binirxînin bê ka derzîbûn ji bo we derbasdar e yan na.

Ez ê çawa bêm derzîkirin?

Ji bo bên derzîkirin, divê hûn li nivîsgeha bijîşkê xwe yan jî li cihê ku hûn piranî tên derzîkirin bigerin. Derzîkirin bi tenê serlêdanek pêwîst dike.

Li gel bijî kŒ xwe an jî li gel cihŒ ku hßn piranî tŒn derzîkirin hevdîtinekŒ çŒbikin.

ZŒdetir bixwînin di:

sst.dk / influenza